Peyva Serok Barzanî li vekirina Pira Balinda 26 Gulana 1996ê

Bismîllahîrrehmanlrrehîm

Hevalên hêja …

Di vê roja dîrokiya pîroz da , roja 26î Gulanê , Xo bextewer dizanim digel hewe beşdarî bikem divekirina Pira Balinda , eve Karekê ne yê biçûk bî û ne yê asan bî . Drustkirineva Pira Balinda heqîqetek nîşanda ew jî eveye eger mirovî bawerî bixo hebît û eger kêmek îmkaniyatîş didest da hebin , dikarît tiştê zorê mezin biket .

Supas bo xudê ku dinav milletê kurd da kurên wesa yê hey ku bawerî bixo hebît ke bi îmkaniyateka kêm , karekê hoyê mezin encam biden , nimûne jî bo vê muhendisê pir tiwana kak (îbrahîm) û hevalên wî ne , hîvîdarim nimûnê wa zor bin dinav milletê kurd da bo xizmeta kurd û Kurdistanê û hîvîdarim temen rêkê bided wê rojê bibînîn ku sedda Balinda û sedda Dêrelokê jî bibînîn bi destê kurên kurd bihête dirust kirin û bihête vekirin .

Bi vê munasebetê bi pêwîst dizanim supasiya hemî wan dezgeh û rêkxirawa bikem ku beşdarî kirî we komek kirî bo dirustkirneva Pira Balinda wek parêzgeha Duhokê û heya îxasa îslamî û rabîta îslamiya kurdî û rêkxirawa Mişna Frensî .

Xûşku û birayên hêja …

Birastî rêveberiya Rîk û Pira li parêzgeha Duhokê , eve ne cara êkê ye serê me bilind diket belki çendên pirojên dî jî wan encam dane û hemî dixizmeta gelda bûne . Hîvîdarim çewa milletê kurd dixebata çekdariyê da û dixebata bergiryê li Kurdistanê serkeftî bû , serkeft wesa dixebata avedankirinê da yê serkeftî bît û ez bi bawerim ku bi dest û bazoyên van kurên qehreman dê herê serkeftî bîn .

Hîvîdarim ev destên ku ava diken her sax û pir hêz bin we dişikestî bin ew destên xirab diken .

û bi vê munasebetê , ez bi pêwîst dizanim ku rêveberiya Rêk û Pira li Parêzgeha Duhokê û bitaybet muhandis (îbrahîm) û hevalên wê ku ev piroje encamday bihête xelat kirin û binavê milletê kurd ez supasiya wa dikem û supasiya we jî hemiya dikem , hîvîdarim hemî rojêt me her bo hindê bin bo vekirina pirojên wekî Pira Balinda ku dixizmeta gel û welat da bin û ku çend dujmin û nehez Kurdistanê xirab biken mugabil wê lazme hîmetê bikeyn ava bikeyn û nehêlîn şînewarêt xirabiyê li cihekî bimînin li Kudistanêda û dawa serkeftinê bo we dikem .. zor supas

Serok Mesûd Barzanî

Li vekirina Pira Balinda li 26î Gulana 1996ê